

## Hewla têkdana danûstandinên yekrêziyê tê dan

**Kurdistan** Îmad Hesên



Di dema dawî de, hejmareke serkirdeyên Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD, daxuyaniyên tund li dijî Encûmena Niştîmaniya Kurdî

li Sûriyê ENKS û damûdezgehên wê didin, û hewil didin bi rêya van daxuyaniyan hewlên yekrêziya nava mala Kurdî li Kurdistana Sûriyê têk bidin.

Mihemed Ebdulselam li ser vê mijarê wija ji rojnameya Kurdistan re got, PKK naxwaze ev danûstandin biçê serî, ji berk u ew ji vê rewşa niha sûdmend e, û dihêlê

ku destikên wê di nava Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD van daxuyaniyan bidin, û ji aliyê xwe ve ENKS istivzaz bibe, û jî bi vî rengî bersivê bide, lê tiştê baş ENKS bi

aqlane tevdigere û nakeve nava van pîlanên de. Alan Ebdula jî dibêje, nabe ENKS mîna PYD bersivê bide, û divê karekî cidî di vê derbarê de bike

daku ti hincetekê ji vê partiye re nehêle, ev partî li ser xerabiyê rabûye û naxwaze danûstandin biçin serî ji berk u sûdmend e.

# Leşkerê Roj nûnertiya projeya netewî dike

Kurdistan-  
Bidûvçûn

Emîndariya Giştî ya ENKSê daxuyaniya endamê Desteya Serokatiya PYDê û Serokê Şanda Danûstandkar a PYNKê Aldar Xelîl şermezar kir û di daxuyaniyekê de ragihand, "Di dema ku gelê ku li benda gihîştina bi rêkeftina yekrêziya kurdî ye, hin serkirdeyên PYDê car carê derdikevin û daxuyaniyan ji bo hilweşandina danûstandinan didin. Ew daxuyanî jî berdewamiya gefxwarina li malbatên Pêşmerge, şewitandina ofîsên ENKSê û partiyên wê û gurkirina ragihandinê li dijî ENKSê ne."

Di daxuyaniya ENKSê de hat: "Daxuyaniya Serokê Şanda Danûstandkar a PYNKê ya ku Pêşmergeyên Roj bi çete bi nav kirine, hewleke din e ji bo revîna ji danûstandinên ku bi serperitşiya Amerîka tîna birêvebirin e û hilweşandina yekrêziya kurdî ye, ji ber ku ew prose dê



rê bide Pêşmergeyên Roj vegehin cihê xwe yên asayî bigirin û berevaniyê di ber herêmên xwe de bikin." Di beşeke din a daxuyaniya ENKSê de hat: "Em wek ENKS tekeziyê li wê dikin, her destdirêjiyek li ser Pêşmergeyên Roj, destdirêji û sivikkirina bi her malbateke kurd e ku kurên wan bi xwîna xwe qurbanî di ber berevaniya li xak û gelê Kurdistanê de kirine."

Herwiha ENKSê di daxuyaniya xwe de got: "Em daxwaz ji aliyê gerentîkar ê danûstandinên kurdî Amerîka û HSDê dikin sinoreke dawî ji van destdirêji û zêdegaviyan re deynin û her kesê baweriya wî

bi yekrêziya kurdî nîn e ji danûstandinan dûr bixe. Herwiha daxwaz ji serkirdatiya PYNKê dikin jî, helwesta xwe ji daxuyaniya Serokê Şanda wê diyar bike û lêborînê ji Pêşmergeyên Roj wan ên qehreman û malbatên bixwaze." ENKSê radigihîne, "Di dema ku em van daxuyaniyan şermezar dikin, ji gelê kurd re tekez dikin ku kurên wan Pêşmerge Roj, xwe ji bo berevaniya di ber gelê kurd de terxan kirine."

Di dawiya daxuyaniyê de jî ENKS tekez dike: "Em tekeziyê li pabendbûna xwe bi berdewamiya danûstandinan li ser perensîpên ku me piştê li ser hev kiriye û

li ser bingeha rêkeftina Duhokê dikin." Ji aliyê xwe ve, Berdevkê Fermî yê Leşkerê Roj bersiva Endamê Desteya Serokatiya Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) Aldar Xelîl dide û radigihîne, "Rastiya ji hemû gelê kurd ve xuya ye ew e, Leşkerê Roj nûnertiya projeya netewî dike û cihekî wî yê pîroz di nava gelê kurd de heye û kî destdirêji lê bike, ew çete ye."

Berdevkê Fermî yê Hêzên Pêşmerge (Leşkerê Roj) Muqedem Şervan Dêrikî di daxuyaniyekê de ragihand, di dema ku gelê me li bendê ye hêviyên wî yên yekîtiya giştîgîr pêk bînin û dawî li tengasiyên wî were û

hêviyên xwe bi vegera Pêşmergeyên Roj dibeste, kesê bi navê Aldar Xelîl daxuyaniyên dûr rehend û perensîpên netewî dide û Pêşmergeyên Roj bi sîfetên herî xirap "çete" û navên din tometbar dike. Ev yek, heqaret û sivikkirina îradeya gelê kurd û destkeftên wê ye ku bi riya salên dirêj ên xebatê bi dest xistine. Berdevkê Pêşmergeyên Roj gotina xwe arasteyî Aldar Xelîl dike û dibêje: "Çete ew e, yê ku xwe li hember pereyan xwe bifiroşe û bibe sedema koçberkirin û derbiderbûna gelê xwe. Çete ew e, yê ku bû sedema dagîrkirina herêmên me ji aliyê artêşa Tirkîyê ve. Çete ew e, yê bac û pereyên giran li ser gel

sepanîye û hiştîye ew ji samanên xwe bêpar bibe. Çete ew e, yê ku zarok revandine û ji bo ecindeyên xwe bi çek kirine û hemû mafên zarokan bînpê kirine. Çete ew e, yê ku îradeya gel bi hemû şeweyan dizîye û hiştîye stûxwar bijî. Çete ew e, yê ji bo belavkirina kî n û nefretê dixebite û sembolên gelê Kurd bi xiyaniyê tometbar dike. Çete ew e, yên wek te bi diruşmên derewîn bazarê bi êş û azarên gel dike."

Herwiha dibêje: "Rastiya ji hemû gelê kurd ve xuya ye ew e, Leşkerê Roj nûnertiya projeya netewî dike û cihekî wî yê pîroz di nava gelê kurd de heye û kî destdirêji lê bike, ew çete ye û ji aliyê dijminên gelê kurd ve kirêkirî ye. Yan kesekî nexweş û derûnxirap e û divê ji civakê bê dûrxistin û li nexweşxaneyê nexweşiyên derûnî û mêjî bê çareserkin." Tekez kir jî, "Helwestên kesê bi navê Aldar Xelîl ne ji encama tesadûfê ye, belkû ew yek ji mezintirîn bazirganên şer li Rojava ye."

## 6 sal bi ser şehîdbûna 4 Pêşmergeyên qehreman re derbas dibe

Kurdistan-  
Bidûvçûn

Roja 7ê Çileyay 2021ê, 6 sal li ser şehîdbûna 4 Pêşmergeyên Roj re derbas dibin, ku di şerê DAIŞê de şehîd bûne. Hûrguliyên çîroka şehîdbûnê ev in:

Di 7ê Çileyay sala 2015an de, 4 Pêşmergeyên Leşkerê Roj li Herêma Kurdistanê, di şerê mezintirîn rêxistina terorê li cîhanê, rêxistina DAIŞa teror de, xwe kirin cangoriya xaka welatê pîroz, û navê xwe di nav pakrewanan de tomar kir. Pakrewan Besam Xelef,

Basil Hacî Hacî, Xemgîn Qedîrî, Emgiyan Badînî, roja Çarşemê di 7ê mehê ji sala 2015an, li dibistana Xerayic li navçeya Tilefir li Herêma Kurdistanê bûne qurbanî û şehîd bûn.


Rêxistina DAIŞa teror di rêya otombîleke leşkerî ji curê Hamir, xaleke kombûneke hêzên Pêşmergeyên Roj, li gundê Birhêwe li navçeya Tilefer kir armanc, di encam de herçar Pêşmergeyên Leşkerê Roj şehîd bûn. Nav û zêdên Pêşmergeyan: Pakrewan Besam Mihemed Xelef ji gundê Girziyaretê Çolê, yê ser bi Girkê Legê yê Dêrika

Rojavayê Kurdistanê ye. Basil Hacî Hacî ji gundê Til Xinzîr yê ser Dêrika Rojavayê Kurdistanê ye. Xemgîn Qedîrî Osman, ji gundê Dîrona Qulinga yê ser Dêrika Rojavayê

Kurdistanê ye. Emgiyan Mustefa Badînî, ji taxa Muftî ya bajarê Hesekê yê Rojavayê Kurdistanê ye. Di 8ê Çileyay sala 2015an, ango piştî şehîdbûna wan bi

rojekê ji bo Rojavayê Kurdistanê hatin rêkirin, û li dergehê Sêmalka yê hevînor navbera Rojava û Herêma Kurdistanê de, bi hezaran ji şênîyên Rojavayê Kurdistanê pêşewazî li cinazeyê şehîdan kir. Herwiha şênîyek mezin xatira xwe ji wan Pêşmergeyan li Herêma Kurdistanê li pêş nexweşxaneyê Pizîşka Dadwerî li parêzgeha Duhokê xwestin, û bi cenazeyan re ta sînorê Rojavayê Kurdistanê çûn. Ji bilî penaberên Rojavayê Kurdistanê serkirdeyên Encûmena Niştîmanî ya Kurdî li Sûriyê û Partiyê

Demoqrata Kurdistan Sûriya û berpîrsê nivîsgeha peywendiyên ya PDKSê li Hewlêrê amede bûn. Herçar Pêşmergeyên Leşkerê Roj li nav xaka xwe, li Rojavayê Kurdistanê bi xak hatin spartin. Hêzên pêşmergeyên Roj, ji ciwan û keçên Rojavayê Kurdistanê pêk tînin. Li herêma Kurdistanê ketin meşq û rahênanê de. Di şerê DAIŞa teror de, li kêlek hêzên Pêşmergeyan, şerê wan dagîrkeran kir, û bi dehan ji wê hêzê di şerê berevaniya Kurdistanê de, şehîd bûn û navên xwe bi serbilindî û şanaziyeke mazin tomar kirin.



# Efrîn hêj ji girtîgehên nehênî dinale

Kurdistan- Bidûvçûn

Rêxistina Mafên Mirovan li Efrînê di raportekê de diyar kir, li Efrînê hejmarek ji girtîgehên nehênî yên grûpên çekdaran hene ku ti serweriya yasayan û dadweriyê lê nîn in. Di wan girtîgehên de, welatîyên kurd yên tîr revandin, li ser destê wan çekdaran rastî eşkenceyên hovane û kuştinê tîr. Ji wan zindan û girtîgehên:

- 1- Girtîxaneyê Veguhestinê li bajarê Efrîn: di destê çekdarên Cebhe El-Şamiyê de ye. Di vê zindanê de girtî bi awayekî hovane tîr eşkencekirin û piştê ji bo zindana Sico li Ezazê tîr veguhestin.
- 2- Girtîxaneyê Gundê Beradê Ew berê weke Berageheke mezin bû, lê niha kirine zindan û ew jî di bin destê Cebhe Şamiyê de ye û girtiyên navenda bajêr tîr de dimînin, bi taybetî girtiyên jin, li wir jî girtî rastî eşkenceyên gewdeyî û derûnî yên hovane tîr.
- 3- Girtîxaneyê Dibistana Keramê: Ev dibistan ji kevintrîn dibistanên Efrînê tîr naskirin, ew di bin destê Feyleq El-Şam de ye û tîr de beşeke taybet bi girtiyên jin heye ku girtî bi giştî tîr de tîr eşkencekirin.
- 4- Girtîxaneyê Dadgehê: Li heman dadgeha berê ye û taybet e bi girtiyên jin û di bin destê çekdarên Cebhe Şamiyê û MÎT a Tirkîyê de ye, girtiyên jin ji her deverê Efrînê tîr de hene.
- 5- Girtîxaneyê Gundê Tirundê: Di bin destê Mîta Tirkîyê de ye û ji zindanên veşartî yên herî xirab tîr zanîn, li wir jî girtî I awayekî hovane tîr eşkencekirin.
- 6- Girtîxaneyê dibistana Ezhar Efrîn a taybet li Efrînê: Çekdarên Ehrar El-Şerqiyê wê birêve dibin û MÎT a Tirkîyê jî serpereştîyê dike, piraniya girtiyên jin xelkê bajêr û gundên Efrînê ne.
- 7- Girtîxaneyê dibistana El-Îtîhad El-Erebî li Efrîn: Çekdarên Cebhe Şamiyê birêve dibin û tîr de beşeke taybet bi girtiyên jin heye, piştê ev zindan bû navendeke leşkerî.
- 8- Girtîxaneyê Taxa Eşrefiyê: Ew bi xwe maleke kevin e û di destê çekdarê bi navê Ebû Idrîs de ye. Di vê girtîxaneyê

de 4 ode hene, ku 2 ji wan ji bo girtiyên e û hejmara wan digihe 5060- kesî jî.

9- Girtîxaneyê Taxa Mehmûdiyê: Çekdarên Hemzat vî zindanê birêve dibin û tîr de bi dehan girtî hene, jê 2 ode taybet bi girtiyên jin in.

10- Girtîxaneyê Taxa Vêlat: Ew bi xwe malek e û çekdarên Ehrar Şerqiyê wê birêve dibin.

11- Girtîxaneyê dibistana Emîr Xubarî: MÎT a

Tirkîyê bi hevkarîya çend fermandarên grûpên çekdar birêve dibe. Tîr de lêpîrsîn bi kesên ku berê bi Rêveberîya Xweser re kar kiribûn tîr kîrin.

12- Girtîxaneyê Gundê Basûtê: Herwiha bi Zindana Kelehê tîr naskirin û çekdarên Hemzat wê birêve dibin û piraniya girtiyên jin deverên di bin kontrola wê grûpê de ne.

13- Girtîxaneyê Gundê Xirêba Şera: Pêştîr di destê

çekdarên Sultan Murad de bû, niha jî bûye zindanek di destê Polîsa leşkerî û Polîsa sîvîl de ye.

14- Girtîxaneyê Gundê Kefercenê: Di destê Çekdarên Cebhe de ye, girtiyên nikariibin fîdyeya berdanê bidin, li wir tîrê kuştin, ji ber ku 15 heta 20 hezar dolar ji wan dixwazin. Di vê zindanê de girtî hene bêtîrî 2 salan li ser girtîna wan derbas bûye, lê nayin dadgehekîrin û ji

bo polîsa leşkerî û polîsa sîvîl jî neyin veguhestin. Ew grûp li wan girtiyên xwedî dernakevin û red dikin li cem wan in jî.

15- Girtîxaneyê Gundê Şingêlê-Navçeyê Bilbilê: Zindan maleke biçûk e û di destê çekdarên Hemzat de ye ku gundên Şingêlê, Zeerê, Elî Karo û Bêkê kontrol dikin. Zindan bi xwe berê axirek bû û niha di vê zindanê de eşkenceyên hovane bi derheqê girtiyên tîr kîrin, wek kehrebe, blanko, dolab, danîna hesinekî di navbera herdu destên kesê girtî de, Bense ji bo hilkirina dirnaqan, şewitandina bi cixaran, kebla 4 xetî, ji ber vê eşkenceyê hovane, gelek girtî ker û fîlîçî bûne.


16- Girtîxaneyê Meydan Ekbes-Navçeyê Reco: Çekdarên Feyleq El-Şam bi serpereştîya MÎT a Tirkîyê birêve dibe, nêzikî sînorê bi Tirkîyê re hatiye avakirin û tîrê 350400- girtî dike û ji 10 odayan pêk tîr. Piştî eşkencekirin û lêpîrsîna seretayî, girtî ji bo Tirkîyê tîrê veguhestin.

17- Girtîxaneyê Mihetê(Wîstgeh)-Navçeyê Reco: Di destê çekdarên Ehrar El-Şerqiyê de ye. Piraniya girtiyên jin xelkê navçeyê ne û bi zindana herî xirab li navçeyê tîr naskirin.

18- Girtîxaneyê Gundê Kûra-Navçeyê Reco: Girtîgeheke biçûk e, ew maleke nêzikî gund e û di destê çekdarên Feyleq El-Şam de ye.

19- Girtîxaneyê Şiyê-Navçeyê Şiyê: Bi Zindana Ebû Emşe tîr naskirin, ji navê fermandarê girûpa wê deverê kontrol dike hatiye, eşkenceyên hovane tîr de tîr kîrin.

20- Girtîxaneyê Gundê Qermîtîq-Navçeyê Şiyê: Çekdarên Mihemed Casim (Ebû Emşe) fermandarê girûpa Sultan Silêman Şah wê birêve dibin. Di vê zindanê de çend girtî di dema eşkenceyê de bi guleyan hatine kuştin. Bajarê Efrînê ku ji 18ê Adara 2018an ve ji aliyê artêşa Tirkîyê û grûpên çekdar yên opozîsyona Sûriyê ve hatiye dagîrkirin, li gor zanyariyên çalakvanan, heta niha zêdetir ji 6500 welatîyên kurd hatine revandin û li ser destê grûpên çekdara rastî eşkenceyên hovane tîr.



## Nekin Loma



Babîsok Amûdê

Nekin loma ji dijmin hûn ticarî  
 Heger we dest neda hev di vî warî  
 Ev çî nakok û berjwendîne gelo ?  
 Hûn davêjin ser hev bi gunehkarî  
 Gelek şerm û fehêt e li ser me îro  
 Hîn em dijîn di bin dest ên neyarî  
 Ji hev re bê kêr û gur û neyar in  
 Ji xelkê re dost in belê xweş yarî  
 Belê dibin mûm û find ji cîhan re  
 Ji hev , hev dikêşin çal û reş tarî  
 Qet nabin dewlet heger weha bin em  
 Hêviyek pûç e , b'vî rengê sersarî  
 Tenha dest ku hûn nedin hev birano  
 Pêşeroja me , qêrîn û hewarî Derfet hat î bera carek neçe paş  
 Ta hûn nejmîn herdem bi xemsarî  
 Li ber pîs û kolan çima daqultên  
 Li beramber hev tèn bi setemkarî  
 Kuştîyê di ber xelkê ne bi coş in  
 Bi dev sist î , bi çav kor û mirarî  
 Rûnê li ser hungiv û di şan in tim  
 Têne xwar in b' devê kir û gemarî  
 Gul ên bi bîn û geş in li nav baxan  
 Pel diçelmisin bi zûya beyarî  
 Çî bêjim , bi yezdan dûr û dirêj e  
 Nema tèn peyv li ser ziman û zarî  
 Bes e serhişk û ezezîtî Kurdno  
 Bera kar û deng bibin bi hevparî  
 Çima her yek ji we li hêlana bin ?  
 Ne bi hevr bigerînin wî destarî  
 Gerek biçê dema qêrîn û nalan  
 Dema xizan û êş , kul û hejarî  
 Temîn li we be ta mirin û merge  
 Li peyv ên Babîsok bikin guhdarî

## Nezanabûna ziman, mîratek reş e bi ser dagîrkeriyê ve (2)



Mahir Hesên

Di hejmara bûrî ya rojnameya kurdistan de me beşek ji gotara xwe zelal kir , ez dîsa li ser gotara xwe berdewam bikim.  
 Di çavdêriya revenda kurd li Ewropa de, bi xuyayî tê dîtîn ku piraniya zarokên wa bi zimanê beyanî diaxivin û dêûbavê wa xwedî li mîrata bi ser zimanê kurdî de digêrî dernakevin, û rêziman bi gotinên beyanî ji hev dixin , û livhatiya axavtina kurdî seqt û çewt dikin . Ji wa weye ku bi piranî gotinên beyanî di serweriya jiyanê de de biserdikevin, ji ber dikarin pevgerêdana di navbera her du zimanan de, kurdî û ewropî bikar bînin .  
 Ji revenda kurd re diyar dibe ku fêrî kirina zimanê beyanî bi kêr karanîna zimanê dayikê ye , da ku karibin awayê ramanê gelê ewropa têkbigihin , û ji ber çanda dewlemend a Rojavayî giring e , û ev buye sedemek ji belavbûna bikaranîna zimanê beyanî di bin stûyê mala revenda kurd de.  
 Derbarê karanîna zimanê kurdî di jiyana xweya rojane de û di mal de , bi poz bilindî dibêjin : me ew çand û ew ziman navê , em nema li welat di vegevin.  
 Pirs di vir de heye ? Dema dadgehên van welatan ji wa dipirsin hûn çî netewin , bi lez û pez dibêjin em kurd in , sedem jî ev e , bo wergirtina nasnameya niştecihê.  
 Ziman mîna çek bihêz e , û her weha bi saya ziman mirov dikare hest û hestên xwe ragihîne, û ji ber vê yekê fêrkirina ziman ji zarokan re gelek girîngiya xwe heye. pêdivî ye ku malbat û bi teybetî revenda kurd zarokên xwe ji bo fêrbûna ziman û hezkirina netewa xwe şiyar bin û piştguhneixin, û heger zarok bikaribe bi zimanê xwe bi durst axive . Ew destnîşan dike ku hemî daxwazên din



ên jiyanê fêr bibe.  
 Ez dibêjim , tim bêjim : kesê bi zimanê xwe nezan bi zimanê beyanî nabe zana. Lêbelê, kesê ku bi zimanê xwe şareza be û peyvên zimanê xwe bikar bîne dê bêtir bikaribe ramana xwe ji yên netewên din re ragihîne û bêtir bikaribe zanîna xwe pêşbixe  
 Girîngiya ziman di pêşkeftinê de û di pêşvevexistina civakê de gelek heye . Ziman ew e ku nasnameya gelan û neteweyan ji hev vetiqetîne , herger em xwe wekî miletekî cuda ji dewletên dagîrker bibînin çima xwedî li zimanê xwe naderkevin . Gava ku mirov bi zimanek taybetî diaxve , ew çand û dîroka xwe diyar dike û bi regekî din xwesteka avakirina civaka xwe bihêz, hevgirtî dike. Belê di encamê de dikarim bêjim ku civak ji zimanê xwe dest pê dike.  
 pevguhertina çandan de dîsa rola ziman heye, wekî nimûnek ,dema em mişxet bûn , me çanda welatê xwe, ziman û dîroka xwe bi xwe re bir, û zimanê me em bi ewropyan dane naskirin , ji ber vê yekê ew bandor dike û jê bandor dibe. Bi zimanê yê zikmakî, hevdîtîn bi me re kirin , pirs û bersiv me dan , ew ziman bû , yê buyî wekî pirek di navbera me û wan de.  
 Bi saya ziman û bi karanîna wî , mirov di nav gelan de bi rûmet dibe, di nav sînorê Dagîrkeran de ziman bi awayê bingehîn ê têgihîştinê ye, û tevî hewlên têkbirin û ji hevexistina civaka kurd , zimanê me hîn jî maye û dê bimîne zimanê yekem

ê danûstendinê di navbera kurdên li her çar parça. Afirînerî di warên wêje û nivîskarî de bi zimanê zikmakî tête diyar kirin, û her serdema nûjen de jî zimanê kurdî zimanekî zengîne di zanistî, çandê de  
 Armanc ji gotara min çî ye ?!  
 Gera mirovan di jiyanê de ji bo serfiraziyê ye , ev ya herî bingehîn e. Ger em bixwazin bi serbikevin, divê baweriyek hebe û ji bo gihîştina wê pêdiviyek rastîn hebe. Lê pêdivî çî ye

?! Pêdivî zimana

Çawa hûnê fêrî zimanê xwe bibin ?!  
 Ji şaşîtiyan netirsîn . Hewil bide bidomdarî li ser fêrbûna ziman , bi rojane ew şaşîtiyê yê kêr bibin. Ji bilî vê, bêyî tîrsa parvekirina şaşîtiyan tu tucara nagihê serkeftin û ewlehiyê.

Gotina dawî , ziman giyan e, divê ew her dem were parastin û baştir kirin , lewma zarokên xwe bixînin û bidin xwendin

## Azadî



Mihemed Silêman

Helbest: Paul Éluard  
 Wergêr ji wêjeya Firensî: Mihemed Silêman Gabarî

L' ser darên daristanan  
 Xîz û berf û baranan  
 Lênûsên dibistanan  
 Ezê navê te deynim

L' ser wênayên zêrkirî  
 Li ser çekên leşkerî  
 Li ser tancên bê serî  
 Ezê navê te deynim

Li ser zevî û asoyan  
 Li ser perrê nifroyan  
 Li nêv çav û ebruyan  
 Ezê navê te deynim

L' ser penagehên wînda  
 L' dilên pêkhev û cuda  
 Soz jinêvbira derda  
 Ezê navê te deynim

Bi şiyana navê te  
 Bi awazên merşê te  
 Her kes divê bighê te

